



Rostem  
Cehangîrî

“Kurd zehmet e  
ku bikarin bi vê  
hêza xwe pêşiya  
tewaya wan  
sînaryoyên der-  
dorê bigrin”...» 3

Dr. Qasimlo got:  
“Tu çima şermê  
dikî?” Min di  
bersiva wî de  
got ku qurban li  
hemberî cenabê  
te her kesek şermê  
dike”...» 8



Kamil Wehabî

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd  
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# AGIRÎ

## Dr. Şerefkendî di dilê me de dijî

26'ê Xermanana hemû salê gelê Kurd rêberê herî  
leheng, zana, bîrtîj û qedirgiran wate Dr. Şerefkendî  
bi bîr tîne. Ew rêberê ku wek cihgirê herî emegdar ê  
Dr. Qasimlo tê naskirin û di riya gihîştina bi armancên  
gelê Kurd de serê xwe danî û li Pîrlaşêzê, bû mehvanê  
hertimî yê Dr. Qasimlo. Di vê rojê de xortên gelê Kurd  
wê dîsan yad û bîra rêberê xwe zindî ragirin.

Desteya Weşana Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (213) 07-09.2013 Buha (150) Tûmen



Kurdên rojava di  
navbera awareyî û berx-  
wedanê de...» 5



Karesata gündê Qarnê  
...» 6



Cezakirina Beşar  
Esed di nav gumanan  
de ...» 7

## Senaya Amerîkayê biryara êrîşa leşkerî erê kir

Komîteya Derekî ya Sena-  
ya Amerîkayê piştîvroya  
Çarşemiyê 04.09.2013'an bi  
piraniya dangan êrîşa leşkerî  
bi dijî rejîma Sûriyê erê kir.

Senaya Amerîkayê ew biryar  
xiste ber behs û gengeşeyê, û  
wezîrê Parastinê, wezîrê Karê  
Derve ê Amerîkayê, û fermandeyê  
Sitada Hevbeş ya Hêzên Çekdar  
ên Amerîkayê di vê derbarê de  
axavtin kirin.

Senaya Amerîkayê 60 roj derfet  
da serkomarê Amerîkayê, da ku  
di van 60 rojan de derbê li rejî-  
ma Sûriyê bixîne, û hekî serkevtî  
nebû dikare 30 rojên din jî vê  
êrîşê berdewam bike.

Cankirî wezîrê Karûbarê Derve  
ê Amerîkayê ragehand ku: “Pên-  
gavhilnegirtina bi dijî Sûriyê, wê  
peyamek bi tehlûke bo Îranê û  
Koreya Bakûr hebe”.

Wî herweha ragehand ku:  
“Amerîka bi welatên din re keti-  
ye nav têkiliyan da ku dadgehek  
navneteweyî bona dadgehîkirina  
cînayetkarên ku di kuştara xelkê  
Sûriyê de dets hene pêk bihê”.

Li gorî gotina wî Beşar Esed sêy-  
emîn dîktator e ku bi dijî xelkê  
xwe çeka kîmyawî bi kar aniye.





## Îran nîgerantir e

Şehab Xalidî

Di van çend rojên borî de basa êrîşa leşkerî piştî bikaranîna çekên kîmyawî ji aliyê Beşar Esed ve bûye basa herî germ ya ragehandinên giştî, û rejîma Îranê jî zêdetir ji her aliyek din di nav sitrê û dilekutê de dijî, û helwestek tund girtiye û wek berê ragehandine ku ew bi tu awayî destêwerdanên di nav Sûriyê bi riya leşkerî qebûl nakin.

Welatên Ewropayî û bi taybetî Amerîka jî ku heya niha bi sedemên cur bi cur nedixwestin ku destêwerdana leşkerî bikin, niha helwestên tund girtine pêş. Can kirî ragehandiyê ku bersivnedanek tund bi rejîma Sûriyê wê bikare rejîma Îran û Koreya Bakûr di warê bikar anîna çekên kîmyawî de cesûrtir bike.

Bêguman her kes ku şarezayê siyasetê û helwestên rejîma Îranê derheq pirsê Sûriyê de be, bi başî dizane ku Sûriyê hertim hevalbendê Îranê û pêgeha sitratîjîk a Îranê û pira şandina çek û teqemiyên bo girûpên terorîstî û bi taybetî bi dijatîkirina bi Îsrailê re bûye, lewra di nemana Beşar Esed de rejîma Îranê giringtirîn hevalbendê xwe ji dest dide. Lewra jî heya niha li kîsê xelkê Îranê çî nema ku nebexşe Beşar Esed.

Niha ku li gorî wan helwestên karbidestên welatên rojavayî egera êrîşeke leşkerî bihêz bûye asayî ye ku rejîma Îranê dest bo her karekî bibe, bona pêşgîrîkirina ji êrîşeke bi vî awayî, û ya ku zelal e ew e ku zehmet rejîma Îran ew cureya ku gefan dike, bikare li hemberî êrîşeke weha de bi awayeke rasterast bisekine û xwe bike aliyê şer. Bêguman nemana Beşar Esed jî çendqat wê bikare rejîma Îranê jî lawaztir, îzoletir, û ber bi nemanê ve bibe, jiber ku neman dîktatorêkî weha ku zêdetir ji du sala ye komkujiyê dike, dikare morala xelkê têhniyê azdaiyê yên Îranê bihêz û bihêztir bike û wan bi encama her serhildanekê dilgermtir û hêvidartir bike.

## PDK Îranê û Komele: Êrîş bo ser Kempa Eşref bi biryara rejîma Îranê bûye



**K**urdistanmedia: Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê û Komeleya Şoreşgêr a Zehmetkêşên Kurdistan Îranê, di daxûyaniyekî hevbeş de êrîşa bo ser kempa Eşref mehkûm kirin.

Deqa daxûyaniyê:

Daxûyaniya hevbeş  
Em êrîşa bo ser kempa Eşrefê mehkûm dikin

Li gor rapora nûçegihanana, sibê-dehiya roja Yekşemî 1'ê Îlona

2013'an, êrîş û kuştarek hovane li kempa Eşref, ser bi rêxistina Mucahidînên xelk a Îranê birêve çû. Li gor nûçeyan di vê êrîşê û bombebaranê de, zêdey deh kes ji endamên wê rêxistinê şehîd û birîndar bûn.

Her çend hêştê hemû hûrdekariên vê êrîşê nehatiye eşkerekirin, lê gumanek li wê de nine ku ew êrîşa terorîstî bi destê her kes û aliyekê bibe, biryara wê ji aliyê rejîma Komara Îslamî a Îranê ve hatiye

dan, Sipaha Pasdaranên Îranê wê êrîşê bi toleya Îlahî nav dibin û keyfxweşiya xwe ji wê komkujiyê eyan kirin, eva jî wê rastiyê dide eşkere kirin ku rejîma Komara Îslamiya Îranê rêkxer û birêveberê vê cinayetê ye.

Em serbarê mehkûmkirina vê êrîşê û komkujiyê, hevderdiya xwe tevî rêxistina Mucahidînên Xelkê yê Îranê û malbata qurbanîyan radigehînin û bala raya giştî bo vê rastiyê radikişînin ku ewa ne yekem kiriyara terorîstiya rejîma Komara Îslamiya Îranê bûye û ne dawî kiryar jî dibe û hewce ye ku hikûmeta Îraqa Fîdral û Netewên Yekbûyî lêkolînekî tevalî di varê van karesatan de bikin û dijkiyarên micidtir jî li xwe nîşan bidin û ji vê yekê zêdetir îzna rejîma Komara Îslamiya Îranê nedin ku bi awayek bêrehmane xelkê bêbêrevan bikin armanca kiryarên terorîstî ên xwe.

**Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê**  
**komeleya Şoreşgêr ya Zehmetkêşên Kurdistanana Îranê**

## PDK Îranê rêz ji xwendekar û dersxwanên serkevtî girt



**K**omîsyona Komelayatî ya Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê rêûresmek bo xwendekar û dersxwanên serkevtî yê sala xwendina 2012 - 2013 (1391 - 1392) pêk anî û rêz ji wan girt.

Li gor nûçeya malpera Kurdistanmedia, roja sêşemî 3'ê Îlona 2013'an, rêûresma rêzgiartin ji dersxwan û xwendekaran bi beşdariya endamên reberî, pêşmerge û malbatên PDK Îranê,

birêve çû.

Di destpêkê de bi xwandina sirûda netewî a "Ey Reqîb" û ragirtina deqeyek bêdengî bo rêzgiartin ji canê paqij ên şehîdan dest pêkir.

Peyama Komîsyona Komelayatî (pişka pêregehîştin bi karûbarên dersxwanan) ji aliyê Şîrîn Hebîbî ve hat xwandin.

Piştê stranên fulklorî ji aliyê Xolam Fatihî ve hatin pêşkeşkirin û piştê peyama malbata xwendekar û dersxwanan ji aliyê Hejar Rehîmî ve hat xwandin.

Dawîn beşa marasimê bilavkirina xelat û lewhên rêzgiartinê bi ser xwendekar û derxwanên serkevtî de bû.



## Birêz Rostem Cehangîrî: Valakirina Kurdistanê dibe sedema guherîna demogirafiya Kurdistanê û akincîbûna Ereban di cihê wan de.



Lêjneya şopandina rastiya komkujiya kurdên rojava, ku ji nûnerên her çar parçeyên Kurdistanê pêk hatibû, roja 19.08.2013'an gihîşte Kurdistanê Rojava. Piştî çend rojan ew heyet vegeriya, û rapora xwe li ser rewşa kurdên Kurdistanê Rojava pêşkêşî komîteya amadekar a Kongreya Neteweyî ya Kurd kir, û kopiyê wê rapora xwe jî, ji serokê Herêma Kurdistanê re şand.

Di vê derheqê de me hewce zanî ku wek rojnameyên Kurdistan û Agirî, gotûbêjekê bi birêz Rostem Cehangîrî endamê Deftera Siyasî a PDKÎ û endamê heyeta lêkolînê re pêk bînin û ji zimanê wî ve rastiyan ku di Kurdistanê Rojava de ji nêz ve bi çavên xwe dîtine, raxînin ber çavê raya giştî.

**Hevpeyvîn: Şehab Xalidî**

**Pirs: Heyeta lêkolîna komkujiya li Kurdistanê Rojava û derxistina rastiyan ku ji aliyê Kongreya Netewî ve hatibûn avakirin û çûbûn Kurdistanê Rojava vegeriya, gelo we rewşa wir bi giştî di warê ewlehiyê de, û di warê jiyana xelkê wir, we cawan dît?**

**Bersiv:** Herwek hûn agehdar in li ser biryara rêzdar serokê Herêma Kurdistanê ew lêjneya lêkolînê pêk hat, diyar e ku vê lêjneyê pêşniyar û biryarên Heyeta Amadekar a Kongreya Neteweyî

Divêt Kurd bi başî xwe amade bikin, ji ber ku zehmet e ku bikarin bi vê hêza xwe li hemberî tewaya wan sînyaryoyên derdorê bisekinin.

birêve dibir.

Roja 18.08.2013'an ji deriyê Sê-malka em derbazî Kurdistanê Rojava bûn, û em ji aliyê heyetê bi serokatiya Sînem Mihemed Hevserokê Encûmena Gel a Rojava ve hatin pêşwazîkirin, li vir de ez pirr sipasiya mêhvandariya wan û alîkariya wan û parastina wan dikim, jiber ku gellekî hurmeta me girtin û bi me ve mandî bûn. Niha di Kurdistanê Rojava de hêzên hikûmeta Sûriyê nemane, û ew der vala kirine, û welat wek welatekî azadkirî tê dîtin, û ew der ji aliyê PYD'ê û hêzên wê ên çekdar ve tene birêvebirin û parastin, û gund û bajar di destên hêza Kurd de ne.

Di çend herêmên sînorî di navbera herêmên Ereba û Kurdan de carna şer rû dide. Herweha hatin û çûn bi tewahî li jêr çavdêriya tund ya PYD'ê de ye, û rewş di warê ewlehiyê de baş e, lê di warê aborî de rewş pirr xirap e, û av û elektrîk

(berq, kehreba) di hinek bajaran de bi tewahî qut bûye, û tiştên xwarin û vexwarinê pirr kêmtir in, û nebûna derman û duktoran rewş çend qat dijwartir kiriye.

Bi raya min hekî rewş her bi vî awayî berdewam bike, heya salek din yan çend salên din wê karesatek mirovî rû bide. Lewra divêt ku hêzên herêmê bi taybetî Hikûmeta Herêma Kurdistanê û heta rêkxirawên navdewletî û bi taybetî Rêkxirawa Neteweyî yekbûyî divêt çareyekê bo vê rewşa rojava bibînin, jiber ku Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi tenê şiyana çareseriyê ve rewşê nîne.

Lewra me bi tewaya destê û girûpên nav civaka Kurdî û şênîyên wir, wate bi jinan, ciwanan, siyasetvanan, rewşenbîran, rojnamevanan û nojdarên û parêzeran û kesayetiyên olî û neteweyî re hevdîtin pêk anîn, û wan jî rewşa wir ji me re bas û şirove kirin.

**Pirs: Gelo çima we nekarî hûn serdana Amûdê bikin, pirs-girêk di kîderê de bû? Gelo ji bilî Amûdê cihê din hebû ku we dixwest, lê we nekarî ku serdan bikin?**

**Bersiv:** Em derbasî bajarê Amûdê bûn, lê me bi tu kesî re pêwendî nekir, û bi tenê em nav bajar re derbas bûn, jiber ku hêzên PYD û PKK'ê dijî çûna me bo wir bûn, û gotin ku pirseke siyasî û heya eşîrî di wir de hatiye pêş, lewra em nikarin we li wir bi-parêzin, û em bi we re nayên.

Me dizanî ku heyamekê berî niha hinek meşên nerazîbûnê di vî bajarî de çê bibûn, û çend kes bi gulleyên hêzên leşkerî ên PYD'ê ve hatibûn kuştin, lewra nexwestin ku em serdana vî bajarî bikin. Bi raya min ew yek kêmasiyeke karê heyetê bû û divêt me serdan bikiriba, û hevdîtin bi xelkê vî bajarî û kesayetiyên wir re pêk anîba.

Ez bi navê xwe daxwaza lêborînê ji xelkê Amûdê dikim, û eva hêza deshilatdar ya wir bû ku nehêla

Rostem Cehangîrî



em serdana wir bikin. Dema em di nav Amûdê re derbaz dibûn, min tenê li bajarê Amûdê çend alayên Kurdistanê dîtin, lê di bajarên din de min ji yek yan du alayan zêdetir tu aliyê Kurdistanê ji bilî alayên PYD'ê û PKK'ê nedît.

**Pirs: Gelo PYD çima radigehand ku çûna heyetê weha bo derxistina rastiyan dikeve çarçoveya berjewendiya dijminan de? Gelo ma komkujiyek di vê astê de ku PYD bas dikir, ji aliyê cîbheya El-nosre ve rû nedabû?**

**Bersiv:** Nizanim, ya baş ew bû ku PKK û PYD'ê bersiva vê pirsê daban. Lê çûna heyetê di qazancê Kurdistanê Rojava û birêveberên wê ên niha de bû.

Di rastî de min bi wan re axavtin kir, lê gotin û şiroveyên wan ji min re di cihê xwe de nebûn. Lê her kesê ku serdana Kurdistanê Rojava bike, wê zû jêre eşkere be ku gelê me li Kurdistanê Rojava de xwestek û daxwaziyan xwe ên siyasî hene û daxwaza hevgirtineke nîştiman û neteweyî dikin.

Daxwaza birêveberiyekê dikin ku hemû aliyê civaka Kurdistanê têde hevbeş bin. Lewra wan nedixwastin ku di destpêkê de em herne wir.

Li bajarê Qamişloyê de ku wek pêtextê Kurdistanê Rojava tê hesabandin bervajiyê herêmên din ên Kurdistanê Rojava, dem û dezgehên dewleta Sûriyê hêsta têde hebûn û karê xwe dikirin, lewra renga kes yan aliyek hebe ku hest bi hevahengî yan em bêjin hevalbendiyekê di navbera wan û PYD'ê di vê herêmê de dikir. Em dikarin bêjin ku Qamişlo ji aliyê her du aliyan ve tê îdarekirin, diyare ku di warê siyasî de ve yekê nîgeranî hem bo civaka Kurdî û xeyrî Kurdî û hêzên siyasî ên Kurdistanê Rojava çê kiriye.



## Doma R: 3

Niha hêzên Artêşa Azad û Îslamiyên radîkal dema ku êrîşî ser Kurdistanê dikin, dibêjin ku merema me êrîşa bo ser hêzên dewletî di Kurdistanê de ye, lê hekî ew îdiaya wan rast jî be, her destê dewletên herêmê têde heye. Tevî vê ku Kurdan hewil ne-daye ku Kurdistan nebe qada şer, û tenê xwe û xaka xwe parastin, mixabin ku niha bûye aliyê şer. Tirsê min ew e ku piştî nemana deshilata malbata Beşar Esed, dîsan Kurd ji aliyê hêzên dijberî Beşar Esed ve bêne tepeserkirin, ew jî bi vê hêcetê ku Kurd bi Beşar Re bûne.

Divêt Kurd bi başî xwe amade bikin, ji ber ku zehmet e ku bikarin bi vê hêza xwe li hemberî tewaya wan sînyoyên derdorê bigre.

Erdnîgariya Kurdistanê Rojava jî her vê yekê dibêje me, ku sînyoyên neyaran renge bi qazancê Kurd nebe, jiber ku hevgerîtin û yek gotarî li wir nahê dîtin û tenê hêzekê dest bi ser tewaya Kurdistanê Rojava de girtiye, û heta aliyên siyasî dibêjin ku dewletê piştî PYD'ê girtiye.

**Pirs: Dema ku li bajarê Dêrikê we lêkolîn dikir, hîlîkopterên rejîma Beşar Esed ew der bombebaran kir, û piştê we serdana cihê bombebaranê û nexweşxaneyê kir, gelo hekî PYD bi rejîmê re ye, çima ewê wir bombebaran bikin û Kurdan bikujin?**

**Bersiv:** Dema ku em gihîştin bajarê Dêrikê, bi gotina xelkê bajar, danê sibê demjimêr neh heya neh û nîvê, hîlîkopterên rejîma Sûriyê êrîşî ser cihên medenî kirin, lê hêzên YPG'ê tu bersivê nedane vê êrîşî, û vê yekê şik û guman di nav xelkê de çê kiribû, divêt ku hevalên PYD'ê vê bersivê bidin.

**Pirs: gelo ew lêjne heya çî qasî ji karê xwe û hevdiîna bi malbata Beşar re razî bû.**

**Bersiv:** Mixabin ku me nekarî em serdana wan ciyan bikin ku şerê giran têde rû dabû, û xelk têde hatibû kuştin.

Gundên "Tel Eran" û "Til Hasil", di destê hêzên erteşa azad û girûpên Îslamî de ne, mixabin ku xaka Kurdistanê Rojava jî ji du beşan



pêk hatiye, û li ser êk nine, û di navbera wan de Ereb hene.

Em divêt çûban nav xaka Kurdistanê Bakûr û li wir me îzin ji dewleta Turkiyê û ji artêşûa Azad wergirtiba da ku bikarin serdana wan ciyan bikin, ku ew yek jî me re cîbicî nedibû. Ya ku rohn û zelal e, ew e ku li wir şer hebû, li wir xelk hatiye kuştin, jin, mêr, ciwan, pîr, hatine kuştin û yan jî bi dîl hatine girtin, lê bi vî awayî ku bas ji komkujiyê dihate kirin, me tiştê weha nedît. Di rastî de tu kes nebû ku navê deh kesan bide me, ku hatibin kuştin, tenê navê sê yan çar kesan didane me.

Me daxwaz ji wan kir ku hekî film yan wêne hebin ji me re bişînin, lê tunebûn, em li cihêkê bi çar malbatan re rûniştin ku xelkê wan du gundan bûn, me çend demjimêran bi hev re qise kir, û filma vê civînê jî li cem me heye û rapora wê radestî heyeta amadekar ya Kongireya Neteweyî hatiye kirin.

**Pirs: Gelo hûn ji karê lêjneyê bi tewahî razî bûn?**

**Bersiv:** Her çend ku me nekarî ku em serdana tewaya ciyên Kurdistanê Rojava bikin, û bi taybetî ku me nekarî em serdana du gundên Til Eran û Til Hasil bikin, lê dîsan jî me karî ku ji nêzîk ve agehdarê hurdekariyên nav pirsên

pêwendîdar bi vê para Kurdistanê bin, û rapora wê serdanê me bo lêjneya amadekar şand bona ku bigîje destê rêzdar serokê Herêma Kurdistanê. Hekî ji vê dîtingehê ve em li karê lêjneyê binêrin,

belê lêjneya lêkolîna rastiyan serkevtî bû, lê nekarî hemû rastiyan bi dest bixe.

**Pirs: Gelo hekî komkujî li Kurdistanê Rojava di vê astê de ba ku bas lê dihate kirin, Kongireya Neteweyî dikare helwestên tund û bi kiryar hilgire?**

**Bersiv:** Bi raya min Herêma Kurdistanê ku hêza madî, me'newî û leşkerî heye, ji Kongireya Neteweyî zêdetir dikare xwedî helwest

be, lê Kongireya Neteweyî jî, dikare helwestên siyasî ên xwe hebe, û kuştara xelkê Kurd li Sûriyê şermezar bike, û bi awayekî berfireh, daxwaz ji Konseya Ewlekarîya NY bike ku agehdarê rewşa Kurdan be, û daxwazê ji rêkxirawên mirovdust û aliyên siyasî û hikûmetî bike ku Kurdan bi parêzin û alîkarê wan bin.

Lê eşkere ye ku ne tenê Kongireya Neteweyî, belkû heya Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî nikare destêwerdana leşkerî bike, û ew yek dijî pîrensîp û yasayên navneteweyî ye, hêza tewaya Kurdan bi qasî hêza wan dewletan nine ku iha Kurdiostan bi ser

wan de hatiye parvekirin, û hinek alî ku bas ji destêwerdana leşkerî ya herêma Kurdistanê dikin, ew dixwazin bi vî awayî mifaha siyasî ji bizvandina hesta neteweyî ya Kurdan wergirin.

Hekî em li wan hikûmetên Erebi binêrin, em dibînin ku hêzek zaf ya madî û leşkerî hene, lê nikarin destêwerdanê li pirsê Felestînê de bikin, yan bi bê îzna NY, nikarin destêwerdanê di nav pirsên Sûriyê de bikin, lewra Kurd jî ku hêla serxwebûna xwe bi dest nexistine nikarin yasayên navneteweyî binpê bikin û bê îzna NY, hêzên xwe têxin nav xaka Kurdistanê Rojava de.

**Pirs: Gelo bi raya we, bi cih hêlana xaka Kurdistanê Rojava nabe sedema guherîna dîmografîyaya Kurdistanê Rojava, û ma Ereb nakevin cihê wan de?**

**Bersiv:** Her wek me bas kir li vî welatî şer û kêşeyek zêde heye, destê hêzên herêmî û navdewletî di nav vê meselê de heye, bîrsîtî, û bêkarî têde heye, lê nabe ew yek ji bîra me here ku vala kirina Kurdistanê dibe sedema guherîna demografîyaya Kurdistanê û akincîbûna Ereban di cihê wan de. Li gorî axavtina berpirsyanan li bajarê Qamişlo niha piştî koçberbûnê, rêjeya Kurd û Ereb wekhev e. Bi raya min bixwe kempan di cihên aram de çê bikin baştir e ji vê ku cihê xwe bifiroşin. Di wan ciyên ku Kurd hebûne hertim rejîmê siyaseta te'ribê bi kar aniyê, bona vê ku Sûriye bibe welatekî Erebi, ne welatekî Erebi-Kurdî.



## Nerîna Lîderan



Kişanak:

**“Hekî hûn (dewleta Turkiyê) pirsra Kurd çarewser nekin, ewle-hî tunabe, û hûnê perçe perçe bin”.**



Demirtaş:

**“Neh çekarên Cebhet El Nusra li Ceylanpinarê dimînin”.**

Beşar  
Ce'ferî:

**“Amerîka şaşiya di Viyetnamê de ducarî dike”.**



Rûhanî:

**“Rojavayîyan terorîzm di herêma me de bihêz kirine, lewra emê dijî vê yekê derkevin”.**

## Kurdên rojava di navbera awareyî û berxwedanê de



Di despêka serhildana şoreşa Sûriyê, Kurdistanê Rojava ket destê hêzên Kurdî de û bi vî awayî ev pare ji axa Kurdistanê, ji şer û malwêrariyê hinek hat parastin, lê nebûna yekdemî û yekhelwêstiya di navbera aliyên Kurdî de, serbarê vê ku di despêkê de gellek derfetên zêrîn ên weke beşdarî di Encûmena Nîştîmanî a Sûriyê û sepandina Kurd weke parek ji pêkhatiya Sûriyê û heta beşdarî di pêşeroj û qedera welat jî ji dest da, bûye sedema vê ku di heyamên borî de hindêk aliyên Îslamiyên binajoxwaz û cîhadî ên ser bi rêxistina terorîstî ya Elqaîdê li Kurdistanê Rojava ser hildin û fetwaya şer li dijî netewa Kurd ragehînin, eva bû ku me dît di çend navçeyên Kurdistanê li Bakûr û Bakûrê Rojhelata Sûriyê de dest avêtin girtin û kuştina xelkê sivîl.

Piştî derketina girjî û aloziyên di navbera Kurd û Îslamiyên tundrev de, asayîş û aramî di Kurdistanê Rojava de ber bi aloziyê ve çû û, tirs ji Îslamiyan dest bi ser

herêmê de kêşa, eva jî bûye sedema vê ku Kurdên Rojava bajar û gundên xwe çol bikin û ber bi axa Herêma Kurdistanê aware bibin.

Ev koça han cuda ji vê ku hejmarek zaf ji hemwelatîyên Ereben Sûriyê ber bi welatên cîran penaber kirin, li gorî amaran nêzîk bi 200 hezar Kurdên Rojavayê Kurdistanê jî, ber bi herêma Kurdistanê rakêşan û eva jî bûye sedema vê ku bajar û gundên Rojavayê Kurdistanê, ku di rastî de hewce bû niha qada xebat û tekoşînê bona bidestveanîna mafên rewşa gelê Kurd di vê para Kurdistanê de ba, ber bi çolîyê (valabûnê) ve here.

Bêguman eva jî her ew derfete ku desehata Be's a Sûriyê, bi salane ku jê re kar dike û xewnê pêve dibîne da ku bikare bi te'rifkirinê bajar û gundên çolkirî ên Kurdistanê, jinû ve bi netewa Ereben ava bike û bi vî awayî dîmografyaya Kurdistanê Rojava biguhere.

Bêguman karek weha xisarek

Arif vêlî



mezin e bo ser pêşeroja Kurdistanê û di pêşerojê de vegeryana Kurdan bo ser zêd û wargehên xwe karek pir zehmet e, lewra bêtir ev e ku xortên Kurdan, mal û halên xwe bicih nehêlin û bi maneweya xwe berevaniyê ji man û mevcûdiyeta gelê xwe li Kurdistanê Rojava bikin.





Mo'tesem Nûranî

## Karesata gundê Qarnê

Piştî nemana rejîma paşatiyê û hatine ser karê ya rejîma Îranê Kurd çavniherê vê hindê bûn ku bigîjin maf û azadiyên xwe, lê rejîma nû ne tenê berisva xwestek û daxwaziyan wan neda, belkû tepeserî û cînayetên vê rejîmê te digot ku roj û meh û sal in ku ketine pey hev.

Yekemîn buhara bi xwîn û kuştara Sinê, şerê Nexedê û êrîşa bo ser kurdistanê û biryara cîhada Xomênî bi dijî gelê Kurd, di roja 28'ê Gelawêja sala 1358'an (1979) û îdama xelkê sivîl ê bajarên Sine, Pawe, Merîwan, Seqiz û bane bi destê Xelxaliyê cînayetkar û kuştina bi kom ya gundên Qarnê, Qelatan, Îndirqaş, Kanî Seyde, Sewzî û Serçinar, Serûkanî, Dîlançerx, û Kerêzeya Şikakan, û Gêçê û Pîrancix li herêma Somayê, û li gundê Nêrgê li herêma Mirgewera Urmîyê, û îdama 59 ciwanên Mehabadî, û ...hwd dehan û sedan karesatên bi bîrhînerê jînosayda regezî ya vê rejîmê ne li hemberî xelkê bê tawan ê Kurdistanê.

Piştî biryara cîhada Xomênî bi dijî Kurd, carek din dêvê reş ê dîktatorî per û baskên xwe bi ser welat de kêşa û Kurdistan kete nav rewşeke taybetî de, û di nav agirê şereke nexwestî û dasepayî ji aliyê rejîma Axûndî ve dişevitî.

Gund û bajar bi tawana daxwaza mafê neteweyî û azadîxwazî ketibûne ber lehiya agir û asîn û ji hemû aliyekê ve bi hezaran çekbidestê kirêgirtiyên êrîşî ser kurdistanê kirin, hêdê hêdî di hate militarizekirin û li ser bilindahiyên bi hezaran top û tank dihatin xuyakirin û hilkoşer û balafirên şerî ên rejîmê bona çavtirsînkirina xelkê Kurdistanê bi berdewamî di esmanê Kurdistanê de digeriyan û pasdar û komîteçiyên mekteba Hizbulahên çeka "J.3" bi dest, û xencer û bivirbidestên têhniyê xwînê, ji vî gundî bo wî gundî û ji vî bajarî bo wî bajarî rijyane nav Kurdis-



tanê de.

Ji aliyek din ve xebata bê rawestiyên ya xelkê Kurdistanê bo bidestveanîna mafê neteweyî û berberekanîya hêza pêşmerge jî, hêza êrîşkar bi şeweyekê bi hêrs kiribû ku dest ji tu cînayetekê hilnedigirtin û rehim bi tu jîndareke Kurdistanê nedikirin.

Cînayeta roja 11'ê Xermanana 1358'an (1979) li gundê Qarnê mînakek herî ber çav ya siyaseta dijî gelî ya Komara Îslamî ya Îranê derheq xelkê Kurdistanê bû.

Gundê Qarnê ku li heft kîlometriya bajarê Nexedê û li ser rîya Pîranşehr û Nexedê hilketiye, ji nişkêve ji hemû gir û bilindahiyên derdora wê ve, gund kete ber êrîşa hêzên rejîmê. Xelk kete nav dilekutê û nîgeraniyê û ji cihên karê xwe di nav zeviyan de ber bi malên xwe ve reviyên.

Gellek nekêşa ku hijmarek tank û trombêl nêzîkî gund bûn û êrîşkar hatin xwar, û pasdar û çekdarên Mele Hesenî û Zehîrnîjad û Me'bûdî û Qetarî, ji rengê wan ve xûya bû ku kerb û nefret ji wan dibarî û têhniyê xwînê bûn.

Mamosta Mele Mehmûd ku melayekî zana û têgihîştî û welatparêz bû, her zû ji niyeta wan ya xirap têgihîşt, û bilez pirtûka Qur'anê hilgirt û çû

Piştî biryara cîhada Xomênî bi dijî Kurd, carek din dêvê reş ê dîktatorî per û baskên xwe bi ser welat de kêşa û Kurdistan kete nav rewşeke taybetî de, û di nav agirê şereke nexwestî û dasepayî ji aliyê rejîma Axûndî ve dişevitî.

etkarên dîrokê sipî kirin, û ew kiryarên hovane ên Komara Îslamî di herêmê de deng veda, û rojnameya Îtîlaat di 26'ê Xermanana 1358'an (1997) de raporek li ser vê cînayeta bi xof û bi sam nivîsand.

Herweha Mêhdî Behadîran nûnerê Ayetullah Montezirî raporek baş nivîsîbû û perde li ser vê cînayetê vêde dabû, û tawanbar destnîşan kiribûn.

Lê tawanbar ne tenê nehatin cezakirin, belkû ji aliyê rejîmê ve pileyên bilindtir bi wan hatin dayîn.

Yek ji wan Xolamrîza Hesenî nûnerê xomênî bû ku piştî bû nûnerê Xamineyî li parêzgeha Urmîyê.

Di rastî de kuştara Qarnê û gundên din ên Kurdistanê cînayet û paktawa regezî û komkujî û jînosayd û asîmîlasyon bûn ku rejîma Îranê bona jinavbirin û çavtirsandinê berbû canê wan û bi hezaran kes ji xelkê bê tawan ê Kurdistanê şehîd kir.





## Cezakirina Beşar Esed di nav gumanan de



Adil Moradî

**E**va çendîn mehê ku bi ser yekem meşên nerazibûnê û xebata rewşa ya xelkê Sûriyê dijî rejîma gendel û serberedayî ya Beşar Esed re derbaz dibe.

Di vî heyamî de bûyerên karesatbar û xwenîn çêbûn ku hundira mirovên bi vîjdan dihejînin.

Kimyabarana vê dawiyê ya derdora Dîmeşqê di çend rojên derbazbûyî de yek ji girîngtirîn basên rojeva siyasî di deverê û cîhanê de bûn ku tirs destpêkirina şerek din di deverê de anîn holê ku dikare şûnwarên vê bo heyamek zaf pirîşkên agirê şer di deverê de hîlbiket.

Di dirêjîya qirkirina xelkê sivêl û bêgûneh û dirindehiya şerê Sûriyê û kimyabarana roja Çarşemî 21'ê Tebaxê bo ser devereke derdora Dîmeşqê ku zêdetir ji 350 kes hatin kuştin û zêdetir ji 300 kes jî birîndar bûn, gihiştê ev qasê xwe. Piraniya goriyên vê êrîşê jî jin û zarokên bêgûneh û xelkê medenî bûn ku jiyanêke pîr ji metersî di navbera du bereyên şer de derbaz dikan.

Lê eva yekem car nine ku tawanêke bi vî awayî di dîrokê de rû dide, û bêguman heya ku ew rejîma tawanbar û gendel li ser kursiyê deshilatê bin, dawî mînak jî nabe.

Di vê rastayê de dewelatên rojavayî bi rêbertiya Amerîkayê bi tawanbarkirina rejîma Esed bi çekên komkuj dixwazin ku êrîşeke leşkerî bikin ser vî welatî, lê ast û çawanîya vê êrîşê hêla ne zelal e.

Yek ji kêşeyên Amerîkayê li êrîşa leşkerî bo ser Sûriyê kirîza aborî ya cîhanî ye ku Amerîka û welatên din di gel berbirû bûne, û sîbera vê kirîzê giraniyê dixê ser milê hemwelatîyên wan welatan.

Ji aliyeke din ve, ezmûna şerê Efxanistan û Îraqê û domhebûna wan şeran bûye sedema vê ku welatên rojavayî bi parêz ve bereyêke din ya şer bi taybetî di cînaretiya Îsraîlê de veke, ku li raserî dîroka malbata Esed de, heya niha jî ewlehiya sînorên vî welatî parastî bûye.

Ji aliyeke din ve Amerîka û hevpeymanên wê bona êrîşa leşkerî bi dijî Sûriyê di gel nebûna altirnatîveke dilxwaze xwe berbirû ne.

Girûpên opozisyonê dijî sekol û dijî rojava ne, û bi tu awayî şiyana birêvebirina vî welatî

tuninin, ezmûna rojava bo altirnatîvsazî li Îraq, Lîbî, Tunis û Misr jî êşkere kiriye, ku ne tenê her ewlehî û aramî bo siyasetvanên rojavayî bi cih neaniye, belkû bixwe kêşesaz bûye, destpêkirina şerek din di herêmê de bo Rojava û Amerîka karekî hêsan e, lê kontrolkirin û birêvebirina wê li gorî bername û pîlanên wan di jwar û çavnihernekirî ye.

Herweha destêwerdana Îsraîlê di şereke weha de nîgeraniyêke din ya Amerîka û hevalbendên wê ye. Hekî Îsraîl bikeve nav şerek weha de, wê demê şerê Sûriyê berfirehtir dibe.

Rejîma Îranê jî yek ji aliyên şer di Sûriyê de ye, û Sûriyê tenê welatê Erebbî ye ku di destpêka hatine serkarê ya rejîma Îranê de, pêwendiyêke nêzîk bi Îranê re hebûye, û tenê hevalbendê sîtratejîk ê Îranê di heyamê çend salên borî de bûye.

Sûriye bo rêberên Îranê rawestgehek bo şandina terorîstan bo

cîhana derve û şandina alîkariyên madî û mirovî, û çekdarî û locîstîkî bo Hizbullah Lubnan û taqmên Felestînî û ...hwd bûye.

Hebûna sipaha Quds û Hizbullah Lubnan li şerê Sûriyê û şandina çek û teqemenîyan û alavên leşkerî bo vî welatî ji tu kesî veşartî nine.

Li gorî raporên bawerpêkirî li destpêka şerê Sûriyê de heya niha Komara Îslamî zêdetir ji 17 milyon dolar yarmetiya bê hember daye Sûriyê.

Di 34 salên borî de Îran bo Sûriye bankek teji dolar û petrola bi xorayî bûye ku bi dilê xwe bi kar anîne, lê li egera êrîşa leşkerî ya Amerîka û hevalbendên wê bo Sûriyê, Îran ji bilî zêdekirina alîkariyên malî û çekdarî, geşkirina zêdetir ya şerê ragehandinê karek din nikare, û li şiyana wê de nine ku destêwerdana leşkerî ya raseterast zêdetir ji ya ku heya niha kiriye bike.

Herweha li êrîşa bo ser Sûriyê bi pêngaveke giring bo sekinandina sîtratejiya rejîma Îranê û lawazkirina Hizbulahê li herêmê de tê hesibandin, ev pêngav ji aliye Îsraîlê ve jî piştevanî jê tê kirin, serbarê vê ku rejîma Îranê û şexsê Xamineyî êrîşa bo ser Sûriyê wek karesatek bo welatên rojavayî dihesibînin ku encama wê wan jî tevli xwe dike, lê hêzên hevalbendan bi başî vê yekê dizanin ku di rewşa niha de rejîma Îranê nikare destêwerdaneke rasterast bike, û piştîvan û hevalbendên Sûriyê û bi taybetî Rûsiyê tenê dijkiryarên siyasî ji xwe nîşan didin, û li rewşa niha ya hevsengiya hêzên de, xwe tûşî şereke weha nakin.

Ya ku rohn e, pêngaveke bilez û bi kiryar bi dijî rejîma Beşar Esed hewcehiyek bilez û ji nişkêve ye, lê dem, çawanî û şûnwarên wê çavnihernekirî ne.





**K**amil wehabî kurê Qadir sala 1349'an(1970) li bajarê Mihabadê di malbatek navincî de tê dinê. Kamil di Depêka zarokatiya xwe de diçe ber xwendinê û qonaxa despêkî a xwendinê bi dawî tîne û diçe qonaxa nawendî, piştî salekî xwendinê bi cih dihêle û dest diavêje kasibî û karkirinê.

**Hevpeyvîn: Arif Vêlî**

Kamil deheq nasîn û tevlîbûna xwe bi PDK Îranê re weha dibêje: "Bi sedema vê ku di serdemê şoreşa gelên Îranê kurmamên min û bavê min pêşmerge PDKÎ bûn, her di despêka zarokatiya xwe de min PDK Îranê nas dikir û tevî siyaseta û nêrînên vê partiyê nasyar bûm, lewra di temenê 16 saliyê de, dema ku hêza "Efsîn" a PDK Îranê li herêma "Serşaxan" a derdora Mihabadê akincî bûn, min biryar da ku tevlî PDKÎ bim.

Ez çûm baregehên partiyê û min daxwaz kir ku weke pêşmerge bêm wergirtin, wan jî daxwaza min qebûl kir û bi sedema vê ku kurmamên min di vê hêzê de pêşmerge bûn, her di roja yekemîn de çeka pêşmergeyê dan min, lê ez bo Fêrgeya siyasî-nizamî nehatime şandin. Ez ji wî çaxî ve heya niha bê sekinîn li ser xebat û tekoşîna xwe berdewam im".

Kamil Wehabî roja herî xweş a jiyana pêşmergeyê xwe weha tîne ziman û dibêje: "Sala 1367'an (1989) ez li hêza Kêleşîn pêşmerge bûm, rojekê şehîd Hemze Bêhnam ez gazî kirim û got sibê wê mêhvan bo hêza me bîn, lewra daxwazê ji te dikim ku tu ji mêhvanan re çayê bînî, min daxwaza wî qebûl kir, roja paştir dema mêhvan hatin min dît ku Dr. Qasimloyê rêber e, min di despêkê de rexne ji şehîd Hemze girt ku çima negot min ku kak Dr. Qasimlo mêhvanê hêzê ye?"

Piştê bi şerm û fediyek zaf min çayek ji şehîd Qasimlo re danî, Dr. Qasimlo dema rûçikê min dît zanî ku ez şermê dikim û min re got: "Tu çima şermê dikî?" Min di bersiva wî de got ku qurban li hemberî cenabê te her kesek şermê dike, piştê daxwaz ji şehîd Hemze Bêhnam kir ku min weke pêşmerge tevî xwe bibe, lê min daxwaz jê kir ku heke îmkân hebe ez her li hêza Kêleşîn



## Kamil wehabî pêşmerge PDKÎ

bimînîm, Dr. Qasimlo pirsyar kir çima?

Min di bersivê de got qurban ev berpirsatiye pir zehmet e û ez nikarim wê qebûl bikim. Eva roja herî xweş a jiyana min bû ku hertim li bîra min e û şanaziyê pêve dikim".

Di hember de jî roja herî nexweş a jiyana xwe weha tîne ziman: "Roja 22'ê Pûşpera sala 1368'an(1989) hêzên Agirî û Kêleşîn bi fermandehiya kak Têymûr Mistefayî li geliyê "Gaderan" bûn, piştî şerek giran û pir destkevt bû, hêza pêşmerge bi yek birîndar ku ew jî kak Têymûr bû, karî derbek mezin li hêzên Komara Îslamî bixe, roja 26'ê Pûşperê em bi dilek pir xweş ber bi baregehên partiyê li çiyayê "Dalanper" ve vegeriyan, dema em gehîştin baregehê tewahiya kadr û pêşmerge xembar û dilgiran bûn, wî çaxî ji mere gotin ku Dr. Qasimlo şehîd ketiye. Eva roja her nexweş a jiyana min e ku qet nahê jibîrkirin".

Kamil Wehabî derheq vê ku çima heya niha jiyana hevpar pêk neaniye dibêje: "Bi sedema vê ku ez hertim li navçê û di kar û barên leşkirî de bûme, min nexwestiye ku herim nava piroseya jiyana hevpar de û herweha li ser vê baweriyê me jî ku, heya PDK Îranê cardin venegere Kurdista-

roja 26'ê Pûşperê em bi dilek pir xweş ber bi baregehên PDKÎ li çiyayê "Dalanper" ve vegeriyan, dema em gehîştin baregehê, tewahiya kadr û pêşmerge xembar û dilgiran bûn, wî çaxî ji me re gotin ku Dr. Qasimlo şehîd ketiye. Eva roja her nexweş a jiyana min e ku qet nahê jibîrkirin".

bikin û herweha daxwazê ji wan kesan dikim ku bi her sedemekê di refên hêzên Komara Îslamî de ne, destan ji vê karê qirêj bikêşin û cardin vegerin hembêza gelê xwe".

Kamil Wehabî bi vê gotinê hevpeyvîna xwe bi dawî tîne: "peyama min bo xortên Kurdistanê Rojhelat ev e ku dîroka gelê xwe ji bîr nekin û dilsoz û hevkarê partiya xwe bin û bîn û bi zaniyariyên xwe refên pêşmerge PDK Îranê bihêztir bikin".





Bi merema zêdetir xistine berçav a mijarên taybet bi jinan, ajansa Kurdpayê bi awayek heftane raportekê li ser sê teweran amade dike ku deqê wê bi vî awayî ye:

Heftiya yekem a meha Xermanan sala 1392'an

### 1). Berdewamiya xwekujiya jinan di Kurdistanê de

Diyardeya xwekujiyê di Kurdistanê Rojhelat de, ji aliyekê bi sedema nebûna piştgiriya yasayî û nerîtibûna civakê û ji aliyê din ve rengnedana vê diyardeyê di medyayên giştî de, bûye sedem ku ev diyardeye bi awayek berdewam qurbanîyan bigire.


Tenê di heyamê du heyvên derbazbûyî de 15 jin û keçên Kurd li Kurdistanê Rojhelat dest avêtine xwekujiyê û di encam de canê xwe ji dest dane.

Roja yekşemiyê 3'ê Xermananê, jinek bi navê "Arezû Bêhrûzî" li gundê "Daymav" a ser bi bajarê Nexedê, bi sedema arîşeyên malbatî dawî bi jiyana xwe anî.

Tê gotin ku navbirî xelkê gundê "Rêkawê" a ser bi bajarê Pîranşarê bûye û tevî kesekî xelkê gundê "Daymavê" zewicî ye û bi sedema arîşeyên malbatî agir berda leşê xwe û bi sedema kûrbûna birînen xwe, piştî şevekê di nexweşxaneyê de canê xwe ji dest da.

Ji aliyek din ve di çend rojên derbazbûyî de jinek bi navê "Soxra Xizrî" xelkê "Mîrawa" ya ser bi bajarê Bokanê ji rêya xwe daliqandinê ve dawî bi jiyana xwe anî.

## Rapora heftane ya Ajansa kurdpa derheq bin-pêkirina mafê jinan



Soxra Xizrî a temen 18 salî, heyamê salekê bû ku bi awayek berdewam daxwaza telaqê ji hevjinê xwe dikir, lê daxwaza wê tu carî nehat qebûl kirin.

Herweha di heftiya derbazbûyî de keçek agir berda leşê xwe û piştî çend rojan bi sedema kûrbûna birînen xwe, di yek ji nawendên dermanî ên Kirmaşanê de, canê xwe ji dest da.

Dilşad Îsmâîlzade ya temen 18 salî, keça Hemîd û xelkê gundê "Serawî Berdî Zincîr" a ser bi bajarê Ciwanroyê, bi sedema arîşeyên malbatî agir berdabû leşê xwe.

Eva rêzbenda wan keç û jinan e ku di despêka demsala havînê de, li Kurdistanê Rojhelat dest avêtine xwekujiyê:

### Cihê xiştaya xwekujiya jinan

رێژ	ناو و ناویانگ	تەمەن	شار	مانگ	دۆخێ ریان	شێوهی خۆگۆڕی
1	خاتوون مینایی	-	میانداو	یوشیهر	خیزاندار	نادیار
2	فانمه مینایی	28	بۆکان	یوشیهر	خیزاندار	خۆ هه‌لوانسین
3	سه‌گۆل خانهمی	-	کامیاران	یوشیهر	سه‌لت	نادیار
4	گه‌وه‌هر	-	شێو	یوشیهر	-	خۆ سووتاندن
5	به‌هاره نه‌سه‌دی	-	کامیاران	یوشیهر	-	خۆ سووتاندن
6	گوبرا نه‌حمه‌دی	-	نه‌عه‌ده	یوشیهر	سه‌لت	خۆ هه‌لوانسین
7	-	22	ئیسلام نا‌باد	که‌لاوێز	سه‌لت	خۆ سووتاندن
8	فهریده کامه‌ه‌وا	25	مه‌ریوان	که‌لاوێز	سه‌لت	خۆ سووتاندن
9	به‌هاره	21	سه‌لاسی باوه‌جانی	که‌لاوێز	سه‌لت	خۆ سووتاندن
10	خه‌دیجه محممه‌د ره‌حیم	21	شێو	که‌لاوێز	سه‌لت	چافو
11	شوعله قادری	24	مه‌ریوان	که‌لاوێز	خیزاندار	خۆ هه‌لوانسین
12	دڵنێاد ئیسمائیلزاده	18	جوانیو	که‌لاوێز	سه‌لت	خۆ سووتاندن
13	سه‌رگۆل خه‌ندان	-	سه‌لاسی باوه‌جانی	که‌لاوێز	خیزاندار	خۆ سووتاندن
14	ناره‌زوو به‌هروزی	18	نه‌عه‌ده	خه‌رماتان	خیزاندار	خۆ سووتاندن
15	سوغرا خیزی	18	بۆکان	خه‌رماتان	خیزاندار	خۆ هه‌لوانسین

Te'zîrî hat mehkûmkirin.

Navbirî heyamê 3 salan e ku di benda "Nestwan" a girtîgeha Urmîyê de hukmê xwe derbaz dike.

3). Rewşa jinên benda siyasî - mesebî a girtîgeha Êvînê Îran

Jinên zîndanî di benda siyasî - mesebî a girtîgeha Êvînê, heyamê du salan e ku ji mafê wergirtina îzin û telefûnkirinê hatine bêparkirin.

Jêderan eşkere kir ku 25 girtiyên siyasî - mesebî ên girtîgeha Êvînê, di cihek biçûk de hatine ragirtin û heyamê du salan e ku ji mafê îzin û telefûnkirinê bêpar in.

Ev girtiyên jin di bendek nêzîk bi benda 350 a girtîgeha Êvînê de ku benda mêran e hatine ragirtin.

Xolamhusên Îsmâîlî serokê rekrirawa girtîgehên Îranê, heyamek berî niha ev nûçe bi ne rast da zanîn û ragehand: "Gellek car nûçeyek weha belav dibe ku têde îdî'a tê kirin izin ji girtiyên ewlehî re nahê dan".

"Ferîba Kemalabadî" û "Mahweş Şehriyarî" pitir ji 5 salan e ku bê îzin di girtîgeha Êvînê de hatine ragirtin. Ev du jinên girtî, her yek bi 20 sal hebsê hatine mehkûmkirin.

Herweha çendîn girtiyên din ên weke "Şebnem Mededzade" û "Kobra Benazade Emîrî Xîzî" bi bê îzin hatine ragirtin û hukmê wan ber bi dawiyê ve diçe.

Eva di demekê de ye ku piraniya wan dayikên ku ji îznê hatine bêbeşkirin, xwediyê zarokên kêmtemen ên di navbera 3 - 7 saliyê de ne, bo mînak em dikarin îşarê bi "Faran Hîsamî" û "Miryem Ekberî" bikin.

### Çavkanî:

Ajansa nûçegehaniya Kurdpa Malpera Kurdistan û Kurd Malpera "Ceres"

Kempêna Berevanî ji girtiyên siyasî û medenî ên Kurd

Wergêran : Kamyar



Koln (Rûdaw) - Vîyolînjenê kurd Birûsk Zengene di heft saliya xwe de dest bi xebata vîyolînê kiriye.

Piştî ku di 12 saliya xwe de bi orkestraya senfoniye soloya xwe ya yekem çêkir, Birûsk hem wek muzîsyenê odeyê hem ji weke solîst li tevahiya Ewropayê derketiye tûrneyan.

Birûsk beşdarî gellek bernameyên TV û radyoyan bûye û gellek CD'yên wî hene.

Wî lîsansa xwe li "University of Arts in Gothenburg, Sweden" mastera xwe jî li "Royal University of the Arts in Stockholm" û pisporiya xwe jî di warê solîstiyê de ji "University of the Arts in Zurich" standiye.

Birûsk niha li Swîsreyê alîkariya profesor "Rudolf Koelman" dike û di heman demê li zanîngeha Gothenburgê ya Swêdê mamoste ye. "Prof. Rudolf Koelman" ji bo Birûsk hîsên xwe wiha tîne ziman: "Birûsk yek ji xwendekarên min ê herî baş e.

Ji ber teknîka wî ya pîrr baş û zewqa wî ya muzîkê ya bilind, ew xwediyê wê behreyê ye ku bikare hestên kûr û kêliyên ku nayên jibîrkirin bi guhdarên xwe bide jiyandin.

Min kêfeke mezin ji xebata bi Birûsk re ya çar salên borî wergirt û ez wî weke vîyolînjen, muzîkjenê odeyê, mamoste û hempişeyekî bêhempa dibînim."

Birûskê ku konserteke prîvat peşkeşî kral û kralîçeya Swêdê kir û herwiya peşkeşî kralîçeya Holendayê jî, heta niha ev xelatên jêrîn stendine:

Xelata yekemîn ya "Ingrid, Per Welins"

Xelata "Guido Vecchi"


Xelata "Gustav Holmgrens"

Xelata Zanîngeha Muzîka ya Gothenburgê ya Vîyolînjenên herî behremend

Di Pêşbirka Muzîka Odeyê de Xelata Yekemîniye ya Weqfa Willinska

Pêşbirka Muzîkê Ya "Yamaha" Bûrsa Sandrews

Birûsk dibêje ku ew niha bi vîyolîna "Nicolaus Lupot", ya ku



li Zanîngeha Gothenburgê yê, ders dide.

Ev vîyolîn li Parîsê di sala 1797ê de ji hêla Lupot ve hatiye çekirin.

**Hevpeyvîn: Seyîdxan Kurij**

**Te kengî û çawa dest bi muzîkê kir?**

Di 7 saliya xwe de min dest bi muzîkê û vîyolîne kir. Ez di dibistanê de diçûm dersa muzîkê û min li Swêdê heta dehsaliya xwe perwedeya kemanê dît.

Min di 15 saliya xwe de biryar da ku ezê êdî ji vir û pêda bi awayekî profesyonel bi muzîkê mijûl bibim û min jiyana xwe li ser vê esasê domand.

Tu di şertên çawa de, di bin tesîra kultûrêke çawa de mezin bûyî?

Ji ber ku ez li Ewropayê ji dayik bûm û çanda wê derê jî bi giranî muzîka klasîk bala min kişand, ez li ser rawestiyam.

Min gellek dema xwe da muzîka klasîk, ji ber ku tu çiqasî li ser muzîka klasîk bisekinî, tu wê ew qasî pêş bikevî.

Armanca min jî ew bû ku ez di muzîka klasîk de bi awayekî profesyonel bi pêş bikevim. Ez bi taybetî jî muzîka kurdî guhdar dikim, bi taybetî Mucteba Mîrzadeh, Kamkaran, Hesên Zîrek û dengbêjên Bakûr.

**Di navbera dengbejiyê û muzîka klasîk de çi pêwendî heye?**

Di nav muzîkê û çanda kurdî de cihê dengbejiyê pîrr girîng e. Wek hûn jî dizanin, li Ewropayê tesîra folklorê pîrr e li ser muzîkê.

Wek nimûneyên baş, "Bela Bartok" senfoniya xwe li ser folklorê Mecaristan nivîsandîya. Her wisa Mozart, Prokofieff, Stravinsky û Khatchaturian û yên din ji bo senfoniye xwe folklorê bikaranîne.

Em jî dikarin ji bo dewlemendkirin û modernîzekirina muzîka xwe, folklorê xwe û muzîka xwe ya kevna bikaribînin.

Ez bawer dikim ku Kurd divê li ser folklorê û dengbejiyê pîrr lêbikolin, da ku di pêşerojê de li ser wan materyalan bingehê akademîk ji bo muzîka kurdî ava bikin.

**Li cem Kurdan cihê muzîka klasîk çi ye?**

Piştî wan 4 konserên ku me li Amedê peşkeş kirin, ez pîrr kêfxweş bûm ku gelê Amedê pîrr baş guhdarî konserên me kirin. Belkî niha muzîka klasîk li Kurdistanê kem e, le ez bawer dikim ku di pêşerojê de wê cihê muzîka klasîk li Kurdistanê baştir be û zarokên ku li ser muzîka klasîk kar bikin wê zêdetir bin.

Ez hêvîdar im ku em bikaribin li ser muzîka kurdî ya klasîk bixebitin û hewl bidin ku bi şeweyekî akademîk pêş bikevin.

**Çi plan û projeyên we ji bo pêşerojê hene?**

Beriya heyvekê me 4 konser li Amedê dan û me ders da 30 xwendekarên Konservatuara Aram Tigran.

Ez hêvîdar im ku ez bikarim li pêşerojê de projeye wisa û baştir li Amedê berdewam bikim.

## Gotinên Pêşinan

A: Çiya Mazi



**Dema heywan bê xwê bimînin kevira dialêsî:**

Xwediyê sewalan xwê li ser tahtan dikin û wan xwê didin. Sewal jî ji ber wê yekê hînî tahtan dibin, dema xwê tunebe tenê bi alastina tahtan xwe têr dike an xwe dixapîne. Mirovên hînî tiştêkî dibin jî dema ew tişt tunebe, çî nêzî wî tiştî be xwe bi wî tiştî dixapîne an têr dike.

**Dema hingavtina kerê tê, nanê cotyarî dixwe:**

Wekî dema tiştêk xera bibe nîşanê wê xuya dibe. Mirov dizane ku wê qewimînek çê bibe an bi xwe xuya dike.

**Dengê defê ji dûr ve xweş e:**

Wekî mirov ne di nav bûyeran de be mirov bûyeran bi awayekî rastî nikare şîrove bike. Şîrove wê demê kêma dimîne. Her lêkolîn di cihê xwe de bê kirin nêzî rastiye ne.

**Derbê hirça kevir e:**

Hirç di wateya hovîtiyê tê bikaranîn. Li himber hovîtiyê zor divê. Dema mirov zorê bikar neyne hovîti hê pir dibe. Lê ku mirov wekî ku ew ji zorê fêhm dike mirov jî zorê bike. Hirç ne bi kevir be nare. Dîsa wekî ku hirç dema li mirov dixwe wekî kevir li mirov bikeve.

**Derdê dilan hûr î kûr î dûr î:**

Mirovên bi dil be hûr, kûr û dûr difikirin. Ne ji bo dilketina qîzekê tenê, ji bo dil ketina her tiştî wiha ye. Mirovên ku dilê wî li ser tiştêkî hebe dibe ku ji bo wî tiştî dîn jî dibin.





A: Îdrîs Sitwet

## Şaristana Eywan



Şaristana Eywanê li bakûrê parêzgeha Îlamê hilketiye û nawenda wê jî Eywan e.

li gor van zanyariyan ku di pirtokên dîrûkî de hatine, di berê de navê Eywan "Aryox" bûye û piştê di serdemê sasanîyan de guherîne bo "Aryoxan yan jî Aryohan" ku nawenda Mah Sebendan bûye.

Şaristana Eywanê ji bakûr tevî parêzgeha Kirmanşan, ji rojhelat tevî Aîrwan Çoldawil, ji aliyê başûr tevî Îlam û ji rojava tevî Îraqê hevsînor e û piraniya xelkê vê şaristanê Kelhor in û kurd in û bi kurdî û bi devokên Lorî û Lekî dipeyvin.

Li gor serjimêriya sala 1385'ê Rojî (2006), şaristana Eywan 127,752 kes e û ev deverê wek piraniya bajarên kurdistanê av û hewayek hênîk û xweş û bi piranî dar û bar heye û çavkaniyên ava wê jî zaf in wek çavkaniyên kanî

û rûbar û befr û baran jî digire û axa wê jî pir baş e û piraniya akinciyên vê deverê bi cotkariyê mijûl in û bijîva jiyana rojane a xwe di van zewiyên xwe de berhem tînin û zincîre çiyayên Zagros jî bi navê Banko, manşet û Şirezol li

vir derbaz dibin ku piraniya van çiyayan bi daran hatiye dagirtin û darên Belût, Bine, Zalzalek û Badam hene û piraniya giyayên dermanî jî di van çiyayan de peyda dibin.

Di vê şaristanê de wek bajarên din ên kurdistanê cihên geryanê hene û em dikarin îşare bi gundê torîstiya Xoran, geliyê Korîs, kaniya Sipî, tengeya Rinû, tengeya Koşk, Pilin Kûna, Şêr Pena, geliyê Danok, şikevta Înficârî, Şikevta Tilism, Agirdana Siyahgil, sêkel, Kopika şimîran, Gonbeda Cehangîr û Taqa Şîrîn û Ferhad û .....hwd bikin.

Panahiya vê şaristanê 1153 hezar metr çargûşe ye ku dike %6 panahiya parêzgeha Îlamê.

Bajarê Eywanê bajarek kevn e û kevnariya wê vedigere bo serdemê Sasanîyan û Îslamê û ji ber kevnaretiya wê, şûnwarên kevn jî hene wek:

Devera Rinû, agirdana Sepan ku vedigere bo serdemê Sasanîyan, agirdana Gengîr, Taq Şîrîn û Ferhad û .....hwd.

## Rewşa sînemayên Urmîyê her diçe xiraptir dibe

**Daxistina %75 sînemayên Urmîyê û rewşa xirapiya sînemayan asta kulturîya bajarê Urmîyê li gor bajarên din aniya xwarê.**

Malpera "Şino Bas" bi gotina yek ji karbidestên rejîma Îranê ragihand, di navber 19 sînemayan de tenê 5 ji wan sînemayane ektîvin.

Karbidestê han li dirêjahiya axavtia xwe te got: Ew sînemayên ku bi tavahî nehatine daxistin, bi neçarî û bi awayekî nîme wext kar dikin.

Xwe bi berpirsîyar nezanîna karbidestên rejîma Îslamiya Îranê ji ber astengiyên sînemayên parêzgeha Urmîyê bûye sedema daxistina sînemayan û nebaşîya rewşa wan ku nikarin bersiva hevdarên film li wî parêzgehê de bin.

Berpirsî sînemayên perêzgeha Urmîyê li gel ewê ku rewşa xirapiya sînemayên wê parêzgehê pişt rast kir û eva jî anî ber bas ku pêş hatina ser karê rejîma

Îslamiya Îranê, 20 sînema kêmkirine û niha tenê 15 sînema li wî parêzgehê de mane ku rewşa bîna pişkek ji wan sînemayane li ew perê xirapiyê de ye.

Li gor gotina berpirsî han nûtirîn sînema li parêzgeha Urmîyê 70 sale avabûye û heya niha kelupelê kewin nehatine guhertin û nikarin mefah ji wan wergirin.



**Li kempa Domîz de pitir ji 840 zarokên penaber tûşî nexweşiya derûnî bûne**



**Li kempa Domîzê de ku li Bajarê Dihokê yê Herêma Kurdistanê helkevîtiye, pitir ji 840 zarokên penaber tûşî nexweşiya derûnî bûne.**

Kurdistanmedia: Zêdeyî 840 zarokên penaber li kempa Domîz ku hemû Kurdên Rojavayê Kurdistanê ne, tûşî nexweşiya derûnî bûne û hevcyê bi dermankirinê hene.

Hejmara penaberên kempa Domîz pitir ji 75 hezar kes tede akincî ne ku di vê navebrê de 175 zarok hen ku tû kesekî mal-



bata wan tevî wan nine û temenê wan di navbera 7 heya 18 saliyê de ye.

Hejmara penaberên Rojavayê Kurdistanê li Herêma Kurdistanê roj bi roj zêdetir dibe û heya niha zêdeyî 160 hezar kes hatine herêmê û li hersê Parêzgeh wek Dihok, Hewlêr û Silêmaniyê akirincî bûne.

Herweha zêdeyî yek milyon zarok tarka Sûriyê bûne û pitir ji 3 milyon zarok jî awareyî bajarên Sûriyê bûne



# AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 -FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Tel: (+)9647503640792

## Peykerek ji bo hozanvanê kurd Mezher Xaliqî hat çêkirin

**L**i Kellarê perde li ser peykerê hozanvanê navdare kurd Mamosta Mezher Xaliqê vêde birin.

Peykera han ji peykertaş û xelkê ve hat çêkirin û li giştî a Nahiya ya Kellar hat danîn.

Di vê derheqê de bacanî rageku çêkirina han çar kişandiyê têtçûya li stûyê Bawenûrî bûye. Wî

peykertaşî ragehand ku bi merema ji hozan-Mezher hatiye çêki-peykerê de irê mermer

Rence Bawenûrî nivîskar û çalakvanê warê çandî ê kurd e ku bi sedema teqîna Mîne çavên xwe ji dest dane.



aliyê Namiq Babacan Herêma Kurdistanê hember pirtûkxaneya Bawenûrî ser bi Qeza-

Namiq Bahandiye peykera mehan û wê jî Rence

karê han rêzgirtin vanê kurd Xaliqî rin û di vê madeye kev-bikar hatiye.

## Peykerek ji lîma behrê bo sitranbêjê Kurd, Hesên Zîrek tê çêkirin



**P**eykertaşekî Kurd ji lîm û xîzê sor ê behrê peykerek bo hudemend "Hesên Zîrek" çêdike.

Malpera "Rûdaw" bilav kir, ew peykere ji aliyê "Çinir Nizar" ve tê çêkirin û qebareya peyker hemû bi lîm û xîzê sor ê behrê dibe.

Hunermendê Kurd yê han ragihand, her çend çêkirina peyker karekî gelek sext e, lê hewce ye pitir rêz ji mamosta Hesên Zîrek bihê girtin.

Hesên Zîrek sala 1300'a Rojî li gundê "Hermêle" a ser bi Bokanê ji dayîk bûye û çendîn cara di jiyana xwede tûşî sextiyên jiyânê bûye.

Zîrek tu xwendewariyek nebûye, lê piraniye helbesta stranên wî berhemên wî bixwe bûne.

Hunermendê mezin yê Kurd Hesên Zîrek sala 1350'a Rojî (1971) seba nexweşiya penceşêrê li nexweşxana Bokanê çû ber dilovaniya xwedê.

**B**i amadebûna zarokên Çar parçên Kurdistanê, çaremîn festîvala havîniya Nêrgiz ji aliyê "Nawenda Nêrgiz bo perwerdeya hizrî û huneriya zarok û nuciwanên Kurdistanê Îranê" û girûpa Doq Şarter li bajarê Koyê birêve diçe.

Li gor nûçeya malpera Kurdistan-media, festîvala han roja yekşemî 8'ê Îlona 2013'an, li bajarê Koyê û hola Amfî Tîatra Azadî birêve diçe.

Festîvala Havîniya Nêrgiz hemû salan di dawîya demsala Havînê de û bi hinceta pêşwazîkirin ji vebûna xwendîngehan bi ama-

## Çaremîn festîvala havîniya Nêrgiz bi beşdariya zarokên Kurdistanê li Herêma Kurdistanê birêve diçe

debûna girûpên huneriyên bajar û bajarokên Kurdistanê li bajarê Koyê birêve diçe.

Di vê pêwendiyê de Fatih Salihî birêveberê çaremîn festîvala Havîniya Nêrgiz ragihand, di festîvala îsal de, wezaretê Perwerde, Desteya rêxistina Cemawerî û Pişefên Partiya Demokrat a Kurdistanê, birêveberiya Rewşenbîriya Zarokan/Hewlêr û her wusa kompaniyaya Korek Tilîkom wek alîkarî û sponser, alîkariya çaremîn festîvala Nêrgizê dikan.

gizê dikan.

Girûpa strana zarokên Bakûrê Kurdistanê, girûpa muzîka zarokên Rojavayê Kurdistanê, girûpa huneriyên parêzgeha Hewlêr û Silêmaniyê û her wiha girûpa huneriyên zarokên Rojhelatê Kurdistanê bo heyamê rojekê li bajarê Koyê, mêhvanê Nawenda Nêrgiz û girûpa Doq Şarter dibin.

Di dawîya festîvalê de xelat pêşkeşî girûpên amadebûyî wê bê kirin.

